# TECRUBEYÊN KU JI XEBATA PIŞTEVANIYA DERÛNCIVAKÎ YA LIGEL ÊZDIYÊN LI KAMPA FIDANLIKA AMEDÊ HATINE PÊ



Amadekar: Semra GULER

İNSAN HAKLARI VAKFI 1990 TURKEY FOUNDATION OF HUMAN RIGHTS

UNHCR
The UN
Refugee Agency

Weqfa Mafên Mirovan A Tirkiyeyê 111
2016

# TECRUBEYÊN KU JI XEBATA PIŞTEVANIYA DERÛNCIVAKÎ YA LIGEL ÊZDIYÊN LI KAMPA FIDANLIKÊ AMEDÊ HATINE PÊ

GULAN, 2015-BERFANBAR, 2016

## **RÊBER** / RAGIHANDINA TECRUBEYAN

Amadekar: Semra GULER

Weşana Weqfa Mafên Mirovan A Tirkiyeyê 111
2016

Weşanên Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê 111

Amadekar
Semra GULER

Risma Bergê
Fîdanlik - zarokên Êzdî

WEQFA MAFÊN MIROVAN A TIRKIYEYÊ
Mithatpaşa Cad. 49/11 Kızılay 06420 Ankara
Tel: (312) 310 66 36 • Faks: (312) 310 64 63
E-posta: tihv@tihv.org.tr
http://www.tihv.org.tr

ISBN: 978-605-9880-11-4

Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê li gorî Qanûna Medenî ya Tirk hatiye avakirin û saziyeke der-hukûmetî û serbixwe ye.
Statuya wê di Rojnameya Fermî de(ya bi tarîxa 30.12.1990 û hejmara 20741) hatiye weşandin û ketiye meriyetê

BULUŞ Tasarım ve Matbaacılık Hizmetleri San. Tic., Ankara
Tel: (312) 222 44 06 • Faks: (312) 222 44 07
www.bulustasarim.com.tr

# NAVEROK


Spasî ........................................................................5

Pêşkêşî......................................................................7

Di Raboriya Nêz De Çi Û Çi Qewimî? .......................................9

Bernameya Piştevaniya Derûncivakî .......................................11

Encamên Raçaviyê Yên Di Destpêka Bernameya
Piştevaniya Derûncivakî Û Rapora Nirxandinê ..........................15

Dema Bo Kes Û Komên Ku Di Tesîra Şer De Mane
Xebatên Derûncivakî Bêne Meşandin, Divê Haya
Xebatkaran Ji Van Mijaran Hebe .............................................23

Mînakên Aktîvîteyan ............................................................25

Tesîrên Erênî Yên Xebatên Piştevaniya
Derûncivakî Li Fîdanlikê .......................................................37

Di Berdewama Xebatan De Zehmetiyên
Ku Rû Dan Û Rêbazên Beralîkirina Wan .................................39

Trawmaya Ku Ji Kesek Din Hatî Vegirtin
(Secondary Trauma) .............................................................41

Ber Bi Bidawîkirina Xebatên Piştevaniya
Derûncivakî Yên Li Fîdanlikê ..................................................42

Hin Pêşniyar Bo Ew Kesên Ku Dê Xebatên
Bi Vî Rengî Bimeşînin ............................................................43

# SPASÎ

Spas bo hemû kesên ku bûn piştgirên xebata me ya piştevaniya derûncivakî ya ligel Êzdiyên ku li Amedê, li Fîdanlikê dijîn.

Spas bo hevşaredarên Amedê Gultan KIŞANAK û Firat ANLI ku di destpêka xebatên me de wan jî para xwe ji kelecana me wergirtin û soz dan ku dê şaredarî ji her hêlê ve vê xebatê destek bike.

Spas bo rêvebirên sala 2015an ên Odeya Bijîşkan a Amedê, Şaxa Amedê ya SESê, Şaxa Amedê ya Egitim-Senê, Baroya Amedê, Şaxa Amedê ya Komeleya Mafên Mirovan, Şaxa Amedê ya Komeleya Pisporên Xizmeta Civakî û Şaxa Amedê ya Komeleya Şêwirmendî û Rêberiya Derûnî ku bo birêvebirina koordînasyona vê xebatê bawerî bi Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê anîn, di heman demê de bûn alîkar ku em bigihên dilxwazan.

Spas bo navendên UNHCRê yên li Enqere û Dîlokê ku projeyê pejirandin û di dema meşandina projeyê de bûn piştgir.

Spas bo Şebnem Korur FINCANCI ya seroka Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê, Necdet IPEKYUZ ê yek ji avakarên weqfê, Bariş YAVUZ ê nûnerê Amedê yê Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê, Gamze YALÇIN a yek ji rêvebirên weqfê û Metin Bakkalci yê sekreterê giştî ku ji her hêlê ve piştgirî dan.

Spas bo Mehmet Basri ÇELIK û Semra GULER ên koordînatorên projeyê, Murat ABA, Ilham YILMAZ û Serkan DELIDERE yên xebatkarên Nûnertiya Amedê ya Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê Oznur BOZTAŞ ên xebatkarên Nûnertiya Enqereyê ya Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê ku projeyê meşandin.

Ji ber ku bi dil û can tevli xebatên li Fîdanlikê bûn spas bo kesên ku li jêr navên wan hatine nivîsandin;

Abdurrahman CEYLAN, Abdurrahman YUMRUK, Akin OZYAŞAR, Arjen IMRET, Asiye OZER, Aysel TEKIN, Bahar TIMUR, Didem AYDEMIR, Elif BAGRIYANIK, Elif YARAY, Emin GUN, Emin YUKSEL, Eray ERDEM, Erdal TUT, Esra IPEK, Fatma ÇELIK, Ferat DEMIR, Funda AYDIN, Gizem DOGAN, Gulan YAKLAV, Halime PEKKOLAY, Hasan ELÇIOGLU, Hasan KURUL, Israfil BULBUL, Latif MEŞE, Mahmut PAKDEMIR, Mehmet ATEŞ, Mustafa ZEYBEK, Nazlı ÇIÇEK, Nimet UGURGOL, Nurşin ASLANER, Omer AKBA,

Ozge ÇELIK, Ridvan ŞAN, Sercan UZUN GUNDUZ, Şeyhmus BOGA, Sibel CAN, Veysi IRMAK, Zehra BIÇAK û Zelal VURAL...

Spas bo akademîsyenên wek Şahika YUKSEL, Mehmed Hamid BOZTAŞ, Hasan KANDEMIR, Azad GUNDERCI, Zerrin OGLAGU, Ufuk SEZGIN, Işil VAHIP, Tamer AKER ku bi dillxwazî piştgirî dan bernameyên perwerde û supervîzyonê.

Di şexsê Cotkar, Şehwan, Elyas, Hesen û Xelef de spas bo hemû hevalên Êzdî ku bo xebata me ya piştevaniya derûncivakî ya li Qada Hevpar a Fîdanlika Amedê her tim alîkariya me kirin, bûn navbeynkar ku em bi şêniyên Fîdanlikê re têkilî deynin û li konteynir û malzemeyên me miqate bûn.

Spas bo Koçer, Muzeyyen, Recep û Fevzi (ku weke xebatkarên şaredariyê di koordînasyona Fîdanlikê de cih girtin) ku ji bo hewcedariya cih û hewcedariyên din alîkariya me kirin.

Spas bo xebatkarên Yeryuzu Doktorlari (Doctors Worldwide) û Hayata Destek (Support to Life) ên li Fîdanlikê ku dema hewce kir berê şêniyên kampê bi me ve kirin.

Wekî din bi dil û can spas bo kesên ku me li vir navên wan nenivîsiye lê wê baweriyê dane me ku di xebatên me de ligel me bûne, spas bo dostên Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê û dostên Êzdiyan ku em bi tenê nehiştine.

Bîr û baweriya me ew e ku ev tecrubeyên ku me li vir ragihandine tecrubeyên hevpar in û ji xebatên hemû piştgirên me hatine pê.

***Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê***
*Berfanbar, 2016*

# PÊŞKÊŞÎ

Li gorî rapora Hezîrana 2016an a Komîseriya Bilind a Penaberan a Neteweyên Yekbûyî(UNHCR) di dawiya sala 2015an de li seranserî cîhanê hejmara kesên ku ji cih û warê xwe hatine qewitandin gihaştiye 65.3 milyonan. Dîsa li gorî heman raporê ev yek tê wê maneyê ku li ser rûyê erdê her ji 113 kesan yek jê penaber e. Li gorî daneyên YAZDAya ku bo piştgiriya Êzdiyan hatiye damezrandin ji Tebaxa 2014an ve, bi qirkirina hovî ya komên terorîst ên ku xwe wekî Dewleta Îslamê binav dikin, ji 3000î zêdetir Êzdî hatin kuştin, nêzîkî 7000 jin û zarok hatin revandin û 400.000 Êzdî ji cih û warê bûn.

Nêzîkî 11.000 Êzdiyên ku ji cih û warê xwe hatin qewitandin, xwe gihandin Tirkiyeyê. Êzdî li bajarên cuda, bo wextekê hatin bicîkirin, nêzîkî 6.000 ji wan wextekê li Amedê û navçeyên wê man. Ji Tebaxa 2014an heya dawiya sala 2016an qismek ji van kesan çûn Ewropa, Kanada, Emerîka û Awistralyayê (van dewletan wê demê penaber dihewandin), qismek jî li başûrê Kurdistanê vegeriyan. Li gorî agahiyên dawiya 2016an, li Qada Fîdanlikê ya Amedê hîn jî derdora 1200 Êzdî dimînin.

Êzdî çawa hatin Amedê, di serî de şaredarî, gelek sazî û dezgeyên sivîl ên herêmî û giştî û gelek kesan bo dabînkirina pêdiviyên wan hewl dan. Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê jî, ku bo kesên îşkencedîtî karûbarên tedawî û rehabîlîtasyonê dike, li hember binpêkirina mafên mirovan karûbarên dokumantasyonê dike û derbarê trawmaya civakî de xebatan dimeşîne, bi van sazî û dezgeyan re hewl da ku ji hêla xwe ve tiştin bike.

Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê, bi piştgiriya Komîseriya Bilind a Penaberan a Neteweyên Yekbûyî (UNHCR) li Qada Hevpar a Fîdanlika Amedê ji meha gulanê ya 2015an heya dawiya 2016an bi keda dilxwazan xebata piştevaniya derûncivakî meşand û bi vê yekê hewl da ku pêdiviyên Êzdiyan ên bi vî rengî bêne dabînkirin.

Ev rêber jî bi mebesta ragihandina tecrubeyan hatiye amadekirin; tecrubeyên ku piştî xebatên derûncivakî hatine pê; xebatên ku bi taybetî bo zarokên Êzdî, di wan wextan de, li Qada Jiyana Hevpar a Fîdanlika Amedê, ji hêla Weqfa Mafên a Tirkiyeyê û dilxwazan ve hatine meşandin.

Rêbera ku li ber destê we ye her çiqas îfadeyên teqez bihundirîne jî ji bo wê angaştê nehatiye amadekirin. Mebesta amadekirina vê rêberê ew e ku

dema sazî û kes xebateke bi vî awayî bimeşînin û li ser hin mijarên bingehîn bikevin tengasiyê, bi pêşkêşkirina hin mînakan ji bo beralîkirina wê tengasiyê bibe alîkar.

Em hêvî dikin ku ev rêbera ku ji tespîtkirina pêdiviyan bigire heya nivîsandina projeyê û meşandina wê, ji raçavkirina bandorên erênî yên xebatê bigire heya zor û zehmetiyên hatine kêşandin û rêbazên beralîkirina wan gelek agahiyên girîng dihundirîne, bo kesên ku dil dikin xebateke bi vî awayî bimeşînin kêrdar be.

Berfanbar 2016

***Semra GULER***

Yek ji koordînatorên projeyên
Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê

# DI RABORIYA NÊZ DE ÇI Û ÇI QEWIMÎ?

## -AGAHIYÊN PAŞPERDEYÊ-

Êzdiyên ku niştehên Şingalê bûn di 3ê Tebaxa 2014 an de, piştî êrîşa hovane ya koma terorê ya ku xwe weke Dewleta Îslamî ya Iraq û Şamê binav dikirin, weke hemû insanên din ên ku zilm li wan tê kirin mecbûr man ku malên xwe, bîranînên xwe, hezkiriyên xwe li dû xwe bihêlin û ji cih û warê xwe derkevin. Gelek zarok, jin û pîr di dema revê de tî û birçî man, ji ber kelegerma havînê yan mirin an jî seqet man. Piştî vê rêwitiya zor û zehmet, li herêmê, li bajarên cihê belav bûn. Bi hezaran kes hatin (ew anîn) Amedê, ev têketina ewil ku fersend nehiştibû bo amadekariyan, bi mudaxileya rêvebirên bajêr û sazî û dezgeyên cihê, ket şiklekê. Van insanan ewil li nava bajêr, li Galeriya Hunerê û Navenda Çapemeniyê yên li Qada Jiyana Hevpar a Sumerparkê, li salonên werzîşê yên şaredariyên Rezan û Peyasê û li avahiya Odeya Bazirganiyê hatin bicîkirin. Ji xeynî vana derdora 6000 kes jî li bajar û navçeyên derûdora Amedê bi cî bûbûn. Ji bo dabînkirina pêdiviyên wan ên weke cih, xwarin û cil û berg servîsên lezgîn hatin damezrandin.

Piştî ku hejmara penaberan**(asylum seeker) di wexteke kêm de zêde bû ji hêla Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê û şaredariyên navçeyên navendê ve li Qada Seyranê ya Fîdanlikê ya Yenîşehîrê kon hatin vedan. Gerînendetiya Karûbarên Av û Kanalîzasyonê ya Amedê (DÎSKÎ) daşir, serşok û cilşok ava kirin, Serokatiya Daîreya Karûbarên Tenduristiyê ya Şaredariya Mezin navenda tenduristiyê ava kir, Serokatiya Daîreya Xizmetên Civakî jî xwaringeh ava kir. Serokatiya Daîreya Xizmetên Civakî wekî din, di serî de ji bo zarok û jinan, ji bo kesên trawmatîk mekanên ku karûbarên rehabîlîtasyonê lê bêne meşandin ava kir. Ewlehî di stûyê Serokatiya Daîreya Zabiteyan de bû.

Ji xeynî yên ku çûn bajar û navçeyên din, li Qada Seyranê ya Fîdanlika Amedê êdî 3564 kes diman. Ji destpêka mayîna wan a li Sumerparkê ve gelek kes û saziyên ji Amedê û ji bajarên dordora Amedê bi mebesta piştgiriyê li Fîdanlikê xebat meşandin.

---

* *Ji ber ku di kurdî de bo 'hemû halên penabertiyê' heman peyv tê bikaranîn ji bo ku baştir bê fêmkirin gava hewce bike me navê wê yê bi îngîlîzî jî nivîsand, heke me nenivîsandibe jixwe di wateya 'penaber' de ye*

> *Hinekan jî li ser wê rêya ku tî û birçî li dû xwe hiştin, xizmên xwe winda kirine. Şukran Mizrak a ji Komeleya Jinan a Ceren ku bi dilxweşî bi penaberan re dibile dibêje "dayîkên ku tilîkên xwe xwînî kirine û wê xwînê dane zarokên xwe yên tî, hene" û "hin Şingaliyan li ser zend û piyên termên xizmên xwe navên xwe rihaştine da ku piştre ew term bigihîjin wan'*
>
> -Nûçeyên Tirkî yên BBC

Her çiqas Tirkiyeyê deriyê xwe bo Êzdiyên ku ji qirkirinê direviyan vekir jî wexteke dirêj statuya 'parastina demkî' jî tê de, bo bicîbûnê tu statu neda wan û vê yekê nehişt ku wexteke dirêj ji mafên hiqûq, perwerde û tenduristiyê sûde werbigirin. Komîseriya Bilind a Penaberan a Neteweyên Yekbûyî (UNHCR) jî tê de Neteweyên Yekbûyî wexteke dirêj bi ser Êzdiyên li Fidanlikê de nehat. Heta hinek Êzdî bi derfetên xwe çûn navenda Komîseriya Bilind a Penaberan a Neteweyên Yekbûyî (UNHCR) ya li Enqereyê û serî lê dan. Lê bo wan weke tarîxa hevdîtina ewil sala 2023an hate diyarkirin.

Piştî ku li Fîdanlikê, ji hêla şaredarî û saziyên sivîl ve, ji hêla dilxwazan ve hewcedariyên lezgîn ên weke cih, xwarin, cil û berg û tenduristî hatin dabînkirin rastiyeke din derket holê; meşandina xebatên beralîkirina trawmaya şer. Xebatkarên tenduristiya giyanî yên li Amedê û bajarên derdora wê û xebatkarên qada civakî bo ku xebatên bi vî rengî birêkûpêk bêne meşandin xwestin ku koordînasyon di destê Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê de be. Piştî vê daxwazê ligel sazî û dezgeyên cihê têkilî hate danîn û ji bo ku piştgirî ji Komîseriya Bilind a Penaberan a Neteweyên Yekbûyî (UNHCR) bê xwestin projeyek hate amadekirin. Piştî ku Komîseriya Bilind a Penaberan a Neteweyên Yekbûyî (UNHCR) proje pejirand ji gulana 2015an heya berfanbara 2016an, bi ekîbeke dilxwaz bernameya piştevaniya derûncivakî hate pratîzekirin.



## BERNAMEYA PIŞTEVANIYA DERÛNCIVAKÎ

### Piştevaniya derûncivakî çi ye?

'Piştî tecrubeyên trawmatîk ên derasayî yên weke afet, şer, penaberî dibe ku hin encamên derûnî rû bidin. Piştevaniya derûncivakî şiklekî piştevaniyê yê pir-dîsîplînî ye. Ji ber tecrubeyên trawmatîk pirsgirêkên derûnî yên têkildarî stresa zêde rû didin. Ev dîsîplîn jî hewl dide ku van pirsgirêkan kêm bibin, mekanîzmayên piştevaniyê yên civakî dîsa saz bibin, kesên ku di bin bandora afet û rûdanên derasayî de mane dîsa li jiyana xwe yî asayî vegerin û van kesan li hember rûdanên bi vî rengî, ji bo beralîkirinê hêzdartir bin.

Piştevaniya derûncivakî van esasan dihundirîne; kapasîteya cîga bê bizavdarkirin, hevkariya ligel çavkaniyên cîga bê pêkanîn, xizmetên tenduristiyê yên bingehîn bên entegrekirin, hemû beşên civakê yên di bin bandorê de mane karibin bigihînê, li ser esesên perwerde û agahdarkirinê be, bi feraseteke dûdirêj bidome, bête raçavkirin û bête nirxandin.

Di nav çalakiyên piştevaniya derûncivakî de çalakiyên wilo hene; ewil bo kesên ku di bin bandorê de mane pêdiviyên bingehîn bêne tespîtkirin, çavkanî bêne tespîtkirin û çavkaniyên cîga bêne bizavdarkirin, agahdarkirin û perwerdeyên derûnî, stratejiyên alîkariya xwe bi xwe bên bipêşxistin, civak bête bizavdarkirin, piştgirên dilxwaz bên organîzekirin. Ji hêla din ve

ev her yek jî perçeyekî girîng in di nav xizmetên piştevaniya derûncivakî de; tespîtkirina asta tesîra derûnî li ser civakê, tespîta berbelaviya nîşaneyên psîkopatolojîk, tespîtkirina hewcedarên piştevaniya derûnî û psîkîyatrîk û gihandina xizmetê bo wan.

Piştî tecrubeyeke trawmatîk çawa ku şaneyên derûnî yên cihê rû didin (pirsgirêkên derbarê xewê û xemê de û hwd.), di serî de nexweşiya ji ber stresê ya piştî trawmayê û depresyona major, dibe ku hinek şaneyên nexweşiyên psîkîyatrîk jî rû bidin. Şaneyên psîkîyatrîk dibe ku hema piştî bûyera trawmatîk jî derkevin û dibe ku weke bandorên dûdirêj ên bûyerê jî derkevin holê. Ev şane bi rêbazên weke alîkariya pêşîn a derûnî (guhdarkirina çê, jê re wext-veqetandin, zornedan bo vegotinê, tespîtkirina pêdiviyan û beralîkirin, bizavdarkirina mekanîzmayên piştevaniya civakî) bêne kêmkirin jî, hin kesên ku bibandor bûne li alîkariyê digerin û hewcedarî bi piştevaniya psîkîyatrîk dibînin. Divê şaneyên nexweşiyan bi awayê klînîk bêne nirxandin, xizmetên psîkîyatrîk bi awayê ku mirov bi hêsanî karibe bigihê bê amadekirin, kesên ku berê jî ji hêla medîkal ve dihatin tedawîkirin bêne tespîtkirin û tedawiyên wan bêne berdewamkirin an jî bo kesên ku dê bi dermanan dest bi tedawiyê bikin bi awayê ku mirov bi hêsanî karibe bigihê derman bêne amadekirin. Weke vê, xizmetên şêwirmendiya derûnî jî divê ji hêla pisporên ku li ser trawmaya giyanî perwerde bûne, bê kirin. Bi rêbazên weke terapiya tevgerê ya zanîndar (wexteke demdirêj marûzhiştin, bi armanca kontrolkirinê û hwd.) û terapiyên demkurt (EMDR, terapiyên startejîk û hwd.) jî divê di tedawiyê de ji bo piştevaniya derûncivakî nêzîkatiyeke totalîter hebe.

Piştevaniya derûncivakî, piştî tecrubeyên trawmatîk, yek ji pêkhateyên herî girîng e bo pêvajoya dabînkirina pêdiviyên insanî yên asgarî û divê pêdiviya tedawiya klînîk di nava van pêdiviyan de neyê înkarkirin'.**

## Kurtasiya bernameya piştevaniya derûncivakî ya ku ji hêla Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê ve li Fîdanlikê ligel Êzdiyan hat meşandin

Xebatên bernameya piştevaniya derûncivakî bi keda nêzîkî 35 dilxwazên ku tê de derûnnas, derûnbijîşk (psîkiyatrîst), pisporên xizmeta civakî, şêwirmendên derûnnasî û mamoste hebûn û bi keda koordînatoran hat meşandin.

** *Prof A. Tamer Aker, Zankoya Bîlgiyê*

Bernameyê giraniya xwe da ser du qadên têkildarî hev: aktîvîteyên ku ligel komên ku li gorî temenê zarokan (yên temenê wan di navbera 5 û 17an de), ji 20 kesan hatibûn pê û hevdîtinên derûnî û derûnbijîşkî ku bi taybetî bo mezinan lê hewce bikira bo zarokan jî dihatin kirin.

Mirov dikare merhaleyên başbûna kesên trawmatîk wisa rêz bike: merhaleya ewil a başbûnê avakirina pêbawerbûnê ye ku em jê re dibêjin stabîlîzasyon (westarkirin). Bo hin kesan merhaleyên piştî vê giran in, taqeta hevrûbûnê di wan de nahêle, ji ber wê yekê ev merhale bo wan dibe ku bibe merhaleya dawîn.

Merhaleya duyem a başbûnê, bibîranîn û danîna şînê ye. Ev merhale bo şêwirmendan merhaleya derbirin û marûzmayînê ye.

Merhaleya sêyem; di vê merhaleyê de mirov ji nû ve têkelî jiyanê dibe, bo dahatûyê perspektîf/plan çêdike, biryar dide ku ka dê bi kê bawer be, bi kê nebe.

Di merhaleya ewil de, bi taybetî bo ku zarok ku xwe li cihekî ewle hîs bikin, hîs bikin ku têne peyitandin û wek mirovên rêzdar têne dîtin, girîng e ku ligel şêwirmend têkiliyeke çê deynin. Me di dema meşandina xebatên xwe de raçav kir ku ji ber tecrubeyên xwe zarok gelek zehmetiyê dikêşin bo ji vê merhaleyê derbasî merhaleyeke din bibin. Ji ber vê yekê me bêhtir hewl da ku bi xebatên derûncivakî hestên pêbawerî û hezê ji nû ve derkevin.

Derûnnas û derûnbijîşk ligel kesên ku hewcedariyên xwe yên hevdîtina şexsî anîn ser ziman û ligel kesên ku ji hêla saziyên din ên li Fîdanlikê ve hatin beralîkirin, hevdîtinên derûnî û psîkiyatrîk pêk anîn.

Bo dilxwazan derbarê beralîkirina trawmayê de perwerdeyên teorîk ên bingehîn û perwerdeyên pratîk ên ku di xebatan de bi kêrî wan bê, hatin lidarxistin. Di heman demê de, ji bo ku bandora trawmaya ji kesek din hatî vegirtin (secondary trauma) li ser dilxwazan bê kêmkirin û li hember pirsgirêkên xebata pratîk bibe çareserî supervîzyonên komî hatin lidarxistin.

Li ser rîtuelên esas ên jiyana rojane û yên jiyana civakî ji şêniyên Fîdanlikê û ji kesên ku bi wan re xebatan dikin agahî hatin berhevkirin û ji bo kesên ku bixwazin ligel Êzdiyan xebatan bikin broşurek hat amadekirin.

Bo ku haya civakê jê hebe bê ka çi hatiye serê Êzdiyan kesên ku di vê xebatê de cih girtin tevli hinek civînan bûn û ligel medyaya cîga hevpeyvîn hatin kirin.

Di çarçoveya hefteya mafên mirovan a 2015an de pêşangeheke dîtbarî hat vekirin ku tê de xebatên zarokên Êzdî hebûn.



# ENCAMÊN RAÇAVIYÊ YÊN DI DESTPÊKA BERNAMEYA PIŞTEVANIYA DERÛNCIVAKÎ Û RAPORA NIRXANDINÊ

Di Gulana 2015an de, berî ku 'bernameya piştevaniya derûncivakî ya bo Êzdiyan a Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê' dest pê bike, akademîsyenên ku ji zankoyên û saziyên cuda hatin, bo ku armanca xebatê baştir bê diyarkirin, derbarê rewşê de tespîtan kirin û di berdewamiya bernameyê de jî bûn piştgir.

## Rapora Çavdêriyê ya 16-17ê Gulanê ya Şaredariya Amedê ya li ser Tenduristiya Giyanî ya Şêniyên Kampa Fîdanlikê**

### Kampa Fîdanlikê

### a) Binyada Civakî û Fizîkî

Kampa Şaxan kêm zêde 25 km li dûrî navenda bajarê Amedê ye. Li Kampa Şaxan derdorî 4 hezar kes bi cîh bûne. Li kampan bi rêjeyeke zêde jin û mêrên gihîştî (ji 18 salî mezintir) hene. Hejmara jin û mêran li gorî jimartinên ewil nêzîkî hev in. Ji 18 salî biçûktir 850-900 kes hene. Hema hema di bin her konî de çar kes hene. Têra xwe serşok, daşir û kanî hene. Di nav kampê de bo lidarxistina çalakiyên civakî avahî heye. Qismek ji malbatan li Ewropa û li Kurdistana Iraqê dijîn. Li kampê kesên ku xizmên wan an ew bi xwe weke dîl ketine destê DAIŞê û îşkence dîtine, hene. Li kampê herî kêm deh kesên ku ji hêla DAIŞê ve hatine revandin û bi fîdyeyê serbest hatine berdan, hene. Ew bi xwe nehatibin revandin an rastî tundiyê nehatibin jî piraniya şêniyên kampê

---

** *Mehmet Hamid Boztaş, Îsrafîl Bulbul, Hasan Kandemir, Azad Gunderci, Zerrin Oglagu, Gulsume Oguz*
*Nav li gorî rêza paşnavan a di alfabêtê de, hatine rêzkirin*

yan rastî tundiyê mane yan jî ew tu li cem wan weke çîrok hatiye vegotin. Ligel navendên civakî yên weke cilxane û xwaringeh malzeme li konan hatiye belavkirin da ku ew bi xwe karibin xwarinên xwe çêbikin. Endamên malbatekê hewl dane ku konên xwe li cem hev an li cem ên xizmên xwe vedin. Kamp bi hevkariya xebatkarên şaredariyê û endamên civaka Êzdiyan hatiyebirêvebirin. Li derdora kampê zabitayên ku ji hêla şaredariyê ve hatine wezîfedarkirin, hene. Ligel ku li cem hin konan weke bexçeyên biçûk ku bostan jî lê têne çandin hene jî bo hemû konan ev derfet nîne. Ji bo sekna li cem hev û parastina civaka xwe, xwestekeke zêde derbarê xebata li navenda bajêr an veqetîn û bicîbûna li nava bajêr, nehatiye raçavkirin. Lê tê dîtin ku derbarê hilberandin, berkêşan û rizgarbûna ji rajêriyê de xwestek û fikar hene. Çûna Ewropayê him ji bo ewlehiyê, him jî ji bo fersenda hilberandinê weke hedef tê dîtin. Hatiye raçavkirin ku bi rêya telefonên smart û bi rêya amûrên ragihandinê yên wekî din xwe digihînin xizmên xwe yên li Şingal û Ewropayê û bi vî awayî hewl didin ku geşedanan bişopînin.

Hatiye raçavkirin ku serjimara ciwanên xwende jî ne kêm e. Di nav kampê de, berê berê di organîzasyonên tenduristî û di yên civakî de wezîfe digirin. Yên Îngîlîzî dizanin, hene. Zaravayê kurmancî û qismen jî bi erebî tê axavtin. Ji hêla alfabêtê ve pirsgirêk heye.

### b) Karûbarên tenduristiyê yên li kampê

Li kampê ji bo karûbarên tenduristiyê revîreke birêkûpêk, dermanxane û îstasyona lezgîn a tenduristiyê (112) hene. Du nojdarên ku bi xwe şêniyên kampê ne, berdewam li kampê ne. Îstasyona kontrolê ya lezgîn jî di nav kampê de ye. Karûbarên tenduristiyê yên merhaleya yekem, bi dilxwazî, ji hêla Odeya Bijîşkan a Amedê ve û ji hêla Sendîkaya Kedkarên Tenduristiyê ve hate meşandin. Ligel vê yekê Wezareta Tenduristiyê jî bi wezîfedarkirina bijîşkan a demkî hewl daye ku xizmetên tenduristiyê bêne dayîn. Mijarên ku di merhaleya yekem de çareser nebin, bo karûbarên tenduristiyê yên merhaleya duyem û sêyem têne berhêlîkirin. Ligel vê yekê tê diyarkirin ku ji ber pirsgirêkên madî Nexweşxneya Perwerde û Lêkolînê û ya Zankoyê ketine bin deyneke giran. Karûbarên tenduristiyê yên merhaleya yekem ku ji hêla Bijîşkên Sererd ve hatiye meşandin tê gotin ku wê dest pê bike.

Derbarê derzî û tenduristiya jinan de serê ewil şêniyên kampê û xebatkarên ku karûbarên tenduristiyê dimeşînin zor û zehmetî kêşane lê piştre ku ew bawerî di navbera wan de çêbûye pirsgirêkên bi vî rengî gelek kêm bûne.

Dermanxane li cihekî cihê, li gorî şertên tenduristiyê hatiye avakirin. Hatiye raçavkirin ku têra xwe antîdepresan, antîpsîkotîk û stabîlîzatorên bo xûy lê hene. Dermanên ku bi kontrol tên bikaranîn li cihekî cihê, di bin kontroleke xurt de ne.

## c) Karûbarên tenduristiya giyanî yên li kampê

### c1) Xizmetên ku ji hêla Psîkiyatrîstê pispor ve têne dayîn

Her çiqas di wextê avakirina kampê de ne birêkûpêk be jî, di navbera 14ê Îlona 2014an û 25ê Berfanbara 2014an her hefte, piştî 25ê Berfanbarê du heftayan carekê pisporeke psîkiyatriyê ku kurdiya wî jî baş e, çûye kampê û karûbarên tenduristiyê pêk aniye.

Tabloya yekem profîla nexweşên ku ji hêla pispor ve hatine şopandin dihundirîne. Bi piranî somatîzasyon, êş û encamên depresyonê hene, pê re jî encamên anksiyeteyê yên têkildarî trawmayê xuya dikin. Nêzîkî 70 kesên Mental Reterde hatine tespîtkirin. Lê du ji vana serî li polîklînîka psîkîyatriyê dane. Pênc kesan ji ber enurezîsê serî lê dane. Sê nexweşên psîkoz hene ku ji vana yek jê bîpolar e û yek jî şanî psîkotîk e. Qismek ji kesên ku berî koçbûnê ji ber pirsgirêkên tenduristiya giyanî tedawî dibûn dermanên xwe ji Duhok û Zaxo dane anîn û bi kar tînin. Hin ji van kesan tevî dermanên xwe raporên xwe yên epîkrîzê jî dane anîn. Tena serê xwe yan bi awayekî komorbîd gazincên somatîk ên wekî somatîzasyon û êşa serî di %27ê nexweşan de tên dîtin.

*Tablo 1: Dabeşbûna teşhîsên waqiayên ku ji hêla pisporê tenduristiya giyanî ve li kampa Fîdanlikê ya Amedê hatine şopandin*

| | Nexweşiya Anksiyeteyê | Anksiyeteya Tevlihev Depresyon | Depresyon | Nexweşiya Stresê ya Piştî Trawmayê û nexweşiyên hevgirînê | Epîlepsî | Konversiyon | Wekî Din * | Teşhîs lê nehat danîn an jî nexweşiya tibî |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| N% | 22 | 14 | 8 | 7 | 2 | 9 | 32* | 6 |

**Êşa serî, somatîzasyon, mîgren, psîkoz, nexweşiya bîpolar, enurezîs nokturna*

### c2) Karûbarên ku ji hêla derûnnasê klînîk ve tên meşandin

Ji hêla derûnnaseke klînîk ve (ku ligel ew kesên ku yan ew bi xwe yan jî xizmên wan hatine revandin hevdîtinan lidar dixe) nêzîkî du mehan e her rojên nava hefteyê xizmeta tenduristiya giyanî tê dayîn. Di destpêkê de kesên ku ew bi xwe yan jî xizmên wan hatine revandin tevli hevdîtinan dibin. Piştre kesên din ên ku hewcedariya wan bi piştevaniya giyanî heye û pê dihesin ku piştevaniyeke bi vî awayî tê kirin tevli hevdîtinan dibin. Rojê nêzîkî 7 an 10 hevdîtin pêk tên.

### c3) Karûbarên Tenduristiya Giyanî bo Jinan

Di nav kampê de xaniyekî textîn î duqat bo komxebatên jinan hatiye veqetandin. Li qatê yekem du makîneyên dirûnê bo karên dirûnê têne bikaranîn, li qatê jor jî berhemên jinan tên pêşandan û ev berhem tên firotin.

Bi hevkariya xebatkareke kampê çalakî tên lidarxistin. Ligel ku karûbarên jinan di destpêkê de ji hêla zilaman ve rastî mudaxileyan hatine jî bi demê re ev pirsgirêk hatine çareserkirin. Ligel ku daneyên jimartinê ne rojane bin jî tê gotin ku di nav kampê de 850 jinên ji 18 salî mezintir hene.

Hat raçavkirin ku piştî destpêka xebatên civakî û derûncivakî yên ligel jinan, gelek pirsgirêkên ku di destpêkê de di nav kampê de rû didan kêm bûne.





### c4) Karûbarên Tenduristiya Giyanî bo Zarokan

Bi hevdîtina ku ligel rayedarên kampê hatiye kirin, eşkere bûye ku bi hejmareke 850 an 900 zarok û nestêleyên ji 18 salî biçûktir hene. Hatiye tespîtkirin ku karûbarên perwerdehiyê yên bo zarokan ne bi rêkûpêk in. Ji rojên ewil ve bêhtir ji hêla profesyonelên ŞRD (Şêwirmend û Rêberên Derûnî) ve hin çalakiyên civakî hatine lidarxistin. Bi van xebatan hatiye dîtin ku ji ber ku cihekî girtî tuneye xebat bi zor û zehmetî tê meşandin û di dema van çalakiyan de zarokên ku tevli çalakiyan nebûne xwestine tevlê bibin, her çiqas ev tişt bo xebateke baş bûye asteng jî bi vî tiştî hatiye raçavkirin ku hewcedariya çalakî û xebatên bi vî rengî hene.

Hat gotin ku piştî tevlibûna hin projeyên civakî (pêlîstoka xwe tu bi xwe çêbike û hwd.) derbarê ragihandin û danûstandinê de, derbarê têkilîdanîna zarokan a bo perwerdekaran de pêşveçûn pêk hatine. Li kampa ku jinan konan hatiye pê, ji bo perwerdehiyê xaniyekî prefabrîk heye. Ji bo xebatên derûncivakî koneke cihê nîne. Xaniyê jinan ê ku di bin banê wê de xebatên derûncivakî yên bo jinan tên birêvebirin, car caran ji bo ciwanan jî dibe cihê sûdwergirtinê û ciwan li vir tevli çalakiyên hunerên destkariyê dibin.

Ligel ku piraniya şêniyên kampê rasterast şer nedîtine, dema êrîş hatine deverên nêzîkî wan koç kirine jî, hatiye raçavkirin ku mezin û zarok ji hev re qala çîrokên wehşetê dikin. Hatiye dîtin ku pêvajoya koçkirinê hefteyekê yan deh roj berdewam kiriye û pevgihaştina hin malbatan sê meh daye ber xwe. Hatiye tespîtkirin ku li kampê hejmara malbatên ji hev belavbûyî kêm in û tê

hewldan ku malbat tevî hev bibin. Hatiye îfadekirin ku çend zarok di wextê revê de ji malbatên xwe qetiyane û piştre ev zarok bo malbatên xwe hatine gihandin. Hatiye tespîtkirin ku zarok jî wekî şêniyên din ên kampê xwedî şaneyên trawmatîk ên cidî ne, li hember hin hişyarkeran bertekên neasayî nîşan didin. Hatiye dîtin ku li kampê, derbarê tenduristiya giyanî ya zarokan de bi awayekî cidî, xebateke sehîkirin û piştevaniyê nehatiye meşandin, ji ber vê jî derbarê rêjeyên pirsgirêkên psîkîyatrîk de agahiyeke zelal nîne. Ev agahî gihîştiye ber dest ku ciwanek piştî suicide wefat kiriye.

Hatiye gotin ku şêniyên kampê welatê xwe weke ciheke ewlî nabînin û ji ber wê jî nafikirin ku vegerin, bêhtir dixwazin biçin Ewropayê. Dîsa tê gotin ku çûyîna bi rê û rêbazên asayî zor e û dibe ku wexteke gelekî dirêj li vir bimînin.

### d) Dibistan û karûbarên perwerdehiyê



Hatiye dîtin ku xebatên bo zarokan ên derbarê perwerdehiya bingehîn de kêm in, hejmar û derfetên perwerdekaran li hember hewcedariyê têr nakin, bo zarokên pêş-dibistanê hema hema qet xebat nayên meşandin, kona lîstik û lîstokan nîne. Ji bo ku ji hêla giyanî û fizîkî ve zarok nojdar bigihên û ji mafê xwe yê perwerdehiyê ku mafekî bingehîn e nemînin divê bo van pirsgirêkan çareseriyên mayînde bêne dîtin, heke ev pêk neyên xebatên perwerdehî û hîndekariyê û şertên gihaştineke bi nojdarî wê pêk neyên.

Hatiye dîtin ku ji hêla saziyeke sivîl ve dibistaneke ji sê polan hatiye vekirin, lê ev dibistan têra dabînkirina vê pêdiviyê nake. Cihên ku weke pol têne bikaranîn gelekî biçûk in. Di perwerdehiyê de alfabêt dibe astengiyeke dijwar.

### e) Çalakiyên civakî

Di nav kampê de, rêvabir û şêniyên kampê bi awayekî birêkûpêk tên cem hev. Di rojên cejna Êzdiyan de bi mebesta pîrozkirina cejnê ji bajêr serdan çêbûne, hatiye diyarkirin ku bi sohbetan hatiye xwestin ku pirsgirêkên civakî qismen bên kêmkirin.

Piştî ku şêniyan bi xwe dest bi çêkirina xwarinên xwe kirine, hinekan hûrik be jî hin tişt çandine û tevli çalakiyên civakî bûne, li kampê hêdî bi hêdî guherînên erênî pêk hatine.

## Encam û Pêşniyar

Hatiye raçavkirin ku li kampê, pirsgirêkên ku di destpêkê de rûdidan bi demê re ber bi têkiliyeke ewle ve veguheriye û kesên ku ji hêla civakî ve piştevaniyê dikin û şêniyên kampê ji berê çêtir xwe radigihînin hev.

Ji bo xizmetên derûncivakî di asteke çêtir de bêne dayîn, pêşniyar ev in:

1) Li kampê, dive bi awayekî domdar û mayînde xizmetên tenduristiya giyanî bêne dayîn. Nehatina hin piştevanên ku di destpêkê de hatine kampê dibe pirsgirêk.

2) Aniha li kampê pisporeke psîkîyatriyê û derûnnaseke klînîk li ser tenduristiya giyanî xizmetê didin. Lê divê her yekê yek li wan bên zêdekirin da ku xebateke encambexş pêk were.

3) Herhal divê mahremiyeta cihên hevdîtinan pêk bê.

4) Teqez divê kesên ku dê hevdîtinan bikin baş bi kurdî zanibin. Ev yek wê di ragihandinê de xwedî roleke girîng be.

5) Divê grûbên xeternak (zarok, berasteng, jin, pîrên tenê, kesên îşkence dîtine û rastî tundiyeke zayendî hatine) bi rêbazeke munasîb bêne tespîtkirin û bo xizmetên tenduristiya giyanî yên klînîk bêne beralîkirin.

6) Ji bo ku xebatkarên tenduristiya giyanî (yên ku dê hevdîtinên klînîk birêve bibin) li gorî hewcedariyê karibin ji hêla kesên xwedî tecrube ve bêne supervîzekirin divê plansaziyek bê amadekirin. Dê feydeya vê yekê hebe.

7) Heke xebatkarên tenduristiya giyanî ya jinan di xebatên piştevaniya derûncivakî de bêhtir cih bigirin û van xebatan bi awayekî domdar bêne kirin, dibe ku hewcedariya bo pirsgirêkên klînîk ên tenduristiya giyanî kêmtir bibin. Tê nirxandin ku di xizmeta klînîk de cih negirin jî, bi hêsankariya du derûnnasên jin, bi tevlibûna psîkîyatrîst û pispora xizmeta civakî xebat bêne meşandin dê feydeya wê hebe.

8) Ji bo perwerdehiya zarokên ku di asta dibistanê de ne, divê bêhtir pol bêne vekirin û wextê dersan jî bêne zêdekirin.

9) Ji bo keç û xortên ku balix bûne (nestêle), çalakî bêne lidarxistin dê baş be.

10) Dema ku ji bo zarokên ji 8 salî mezintir xebat bêne meşandin ji şêwirmendên derûnî, dema ku ji bo zarokên ji 8 salî biçûktir xebat bêne meşandin jî ji pêşvebirên zarokan sûde bê wergirtin wê baş be.

11) Lêçûna karûbarên tenduristiyê gelek zêde ye. Divê ev lêçûn ji hêla Neteweyên Yekbûyî yan AFADê ve bê dabînkirin. Ji ber ku budçeyên şaredariyan kêm in divê ev yek di stûyê şaredariyan de nemîne. Ji ber ku pêdiviyeke esas e divê bi rêya kampanyayên piştgiriyê neyê dabînkirin.

12) Divê xebatên derûncivakî li gorî pergalekê, çendê carekê bê sehîkirin, ligel vê jî bi xizmetên tibî re li gorî koordînasyonekê bê birêvebirin.

13) Ji bo ku xebatkarên tenduristiya giyanî trawmatîze nebin, ji dêvla ku heman kes her roj li polîklînîkê xizmet bide hefteyê carekê yan jî heke nexweş ne pirr bin bo du hefteyan carekê xizmeta polîklînîkê bide wê baştir be.

14) Bi mebesta supervîzyonê û ji bo piştevaniya piştgiran wekî xebatên komî yên destekker bêne kirin wê feydeya wê hebe.

# DEMA BO KES Û KOMÊN KU DI TESÎRA ŞER DE MANE XEBATÊN DERÛNCIVAKÎ BÊNE MEŞANDIN, DIVÊ HAYA XEBATKARAN JI VAN MIJARAN HEBE

Di destpêka xebatên piştevaniya derûncivakî de me hewl da ku em pêşniyarên di Rapora Çavdêriyê (ya ku me li jor gelekê wê parve kir) de cih girtibûn bi cî bînin, bo kesên ku bixwazin ji vê rêberê sûde wergirin, li jêr jî pêşniyarên me yên ku him weke encamên vê raporê him jî weke encamên tecrubeyên me derketine holê, hene.

- Divê ewil bo pêdiviyên koma ku dê ligel wê xebatên piştevaniya derûncivakî bêne meşandin analîzek bête kirin.
- Divê bê diyarkirin ku dê bername çawa û ji hêla kê ve bê meşandin û divê budçeya wê jî diyar be.
- Divê xebat ji hêla kesên ku derbarê tenduristiya giyanî û xebatên civakî de pispor in, bêne meşandin.
- Divê kes û saziyên ku derbarê xisara şer a li ser kes û civakê de xwedî zanyariyê bin û karibin empatiyê bikin, berpirsiyariyê hildin ser milên xwe.
- Divê kes û komên ku di bin tesîra şer de mane ne weke mexdûr, weke kes û komên ku li ser xwe mane û derbarê vê de xwedî tecrubeyê ne, bêne dîtin.
- Divê armanca xebatan ew be ku him binyada civakî him ya derûnî xurttir bike û him jî kapasîteya heyî bi pêş bixe.
- Heya ku pêdiviyên weke cih, xwarin û cil û berg neyên dabînkirin wê bandora xebatan xuya neke.
- Bo xebatên derûncivakî divê cihên guncaw ên weke kon an jî konteynir bêne amadekirin.
- Divê cihê ku dê xebat lê bê kirin xebatkar biçin serdana konan û ji şêniyên wê derê re bibêjin ku ka dê xebatên derûncivakî çawa bêne kirin.

- Di destpêkê de, divê li ser rîtuelên rojane û yên kevin ên koma ku dê ligel wê xebat bêne meşandin, heya pêkan be ji wan, heke ne pêkan be ji xebatên civakî yên berî niha agahî bêne wergirtin.

  Wekî mînak berî xebata xwe ya Fîdanlikê me dizanîbû ku Êzdî ji rengê 'şîn' hez nakin. Ji ber vê me biryar da ku wê rengê konan jî tê de em ê bi tu awayî rengê şîn bi kar neyînin. Lê piştre me ligel rûsipiyên wê civakê hevdîtin pêk anî û wan gotin ku rengê 'şîn' bi tenê ji hêla çend eşîran ve nayê bikaranîn û li Fîdanlikê ew eşîr nînin. Welhasil em têgihîştin ku tu agahî ne agahiyeke giştî ye. Gava me fêm kir ku tu astengeke çandî li ber bikaranîna rengê 'şîn' nîne bêhna me fireh bû.

- Dibe ku hin civak bo îfadekirina tengasiyên xwe yên hestiyarî û pirsgirêkên xwe yên tevgerî (guherîna zarokên xwe) termînolojiyeke zanistî bi kar bînin, hinekên din jî peyvên kevneperest û yên têkildarî baweriyê bi kar bînin. Heke zanebûna kesên ku dê xebatê bimeşînin têra vê yekê bike, dê feydeya wê hebe.

- Di meşandina xebatan de divê neyê jibîrkirin ku pêvajoya şîngirtinê bo her kes û her civakê ji hev cuda ye. Êzdî bo serdema ku weke qirkirina 73an bi nav dikin şînek danîne ku qet naqede. Di nav xebatan de, gava zarok nereqisin an jî stranên kêfxweşiyê nestirên divê xelet neyê fêmkirin, heya zarok amadebûna xwe nîşan nedin an jî nexwazin divê xebatkar zor nedin zarokan.

- Bo çareserkirina gazincên derûnî yên kesên ku di bin tesîra şer de mane, divê kesên pispor hevdîtinan bikin.

- Piştî hevdîtinên şexsî, kesên ku hewcedariya wan bi tedawiya psîkiyatrîk hebe divê bo derûnbijîşkan bêne beralîkirin.

- Bo kesên ku xebatan dimeşînin, ji bo ku we biparêzin û bi pêş bixin, bi awayekî birêkûpêk supervîzyon hewce ye.

- Raçavkirin, nirxandin û raporkirin bo dîtina merhaleya xebatên derûncivakî û bo dîtina piştî wê merhaleyê girîng in.

## MÎNAKÊN AKTÎVÎTEYAN

Dema ku me bi 35 dilxwazan ku tê de derûnnas, pisporên xizmeta civakî, şêwirmendên derûnî û mamoste hebûn, bo zarokan (temenê wan di navbera 5-17 de) dest bi xebatên piştevaniya derûncivakî kir; me koma xebatê ava kir da ku em çalakiyên cihê yên ku ji hêla her komê ve li gorî xwe dihat amadekirin û sepandin, bixin formeke standard. Ji xeynî tecrube û zanyariyên xwe me ji çavkaniyên cihê sûde wergirt û me modula ku li jêr e, amade kir.

# MODULA KU LI FÎDANLIKÊ BO BERNAMEYA PIŞTEVANIYA DERÛNCIVAKÎ HATIYE BIKARANÎN***

### Trawmaya Şer Encamên Bi Çi Awayî Derdixînin Holê?

» Qurf li mirovan peyde dike.
» Qada ewle tune dike.
» Zerar digihîne derdora ewle.
» Baweriya bi dinyaya heqanî kêm dibe.
» Destbikariya civakî zerar dibîne.
» Hîsa aîdiyetê zerar dibîne.
» Xemgîriya bo dahatûyê peyde dike.
» Nependîtiyê zêde dike.
» Berbelavbûnê zêde dike.

*** *Sazkirina modula pratîk; dilxwaz, sererastkirin; M. Basri Çelik, M. Emin Gun û Semra Guler*

## MERHALEYÊN XEBATÊN BO ZAROKAN ÊN DI ÇARÇOVEYA BERNAMEYA XEBATÊN PIŞTEVANIYA DERÛNCIVAKÎ DE

### Sazkirina Çarçoveyê

- DEM

» Divê endamên komê berî xebatê bi rojan hay ji roja xebatê hebin, heke bû û pirsgirêk derket wê çaxê divê endamên komê berî wê rojê bêne haydarkirin.

» Divê saeta destpêkirin û xilaskirina çalakiyan diyar be.

» Divê ji berê de wextê çalakiyan hatibin plankirin û endamên komê ji berê de hatibin haydarkirin.

- NAVEROK

» Li gorî dora aktîfî û pasîfiyê, herî kêm divê du çalakî bêne lidarxistin.

» Piştî her xebatê derbarê her xebata bê de divê endamên komê bêne agahdarkirin.

» Piştî ku derbarê xebata bê de agahî hat dayîn divê rexne, xwestek û ramanên endamên komê bêne guhdarkirin û wek kom divê bêne nîqaşkirin

- ŞOPANDINA ENDAMÊN KOMÊ

Kesên berpirsiyar divê berdewamî, pêşveçûn, cudahiyên şexsî, hebe nexweşî an jî pirsgirêkên din, veqetînên ji komê û sedemên veqetînê yên endamên komê bişopînin û li cem xwe binivîsin.

- DILXWAZÎ YAN BERPIRSIYARÎ?

Wekî profesyonel, ji bo tevlibûna xebatên ku bi vî awayî hesasiyet pêwist e, dilxwazî esas e û ji bo destpêkê motîvasyonek pêwîst û girîng e. Lê bi meşandina xebatan tecrubeyek çêbû û li gorî vê tecrubeyê hate dîtin ku dilxwazî li hember berdewamiya xebatan dibe asteng, ji koordînasyonê

re dibe asteng û ev yek dibe sedema bandoreke neyînî li ser têkiliyên di navbera dilxwaz û koordînasyonê de, di navbera dilxwaz û endamên komê de û di navbera koordînasyon û endamên komê de.

Ha ji ber vê yekê em ji dêvla têgeha “dilxwazî” têgeha “berpirsiyarî” guncaw dibînin.

Heke ne wisa be merhaleya avakirina çarçoveyê bo endamên komê dibe tiştekî negengaz. Ji ber ku jixwe endamên komê berbelav in, bêsînor in, xwedî nêrîneke nependî ne.

Heke kesên berpirsiyar bi hestên dilpêşewitandin û sempatiyê nêzîkî endamên komê bibin, wê bibe sedema xerakirina çarçoveya berpirsiyariyê. Ev nayê wê maneyê ku wê temasî zarokan neyê kirin. Kesê/a berpirsiyar divê cihê xwe li hember endamên komê biparêze û têkiliya di nabera xwe û wan de xurt bihêle û li gorî van mercan sînorê xwe diyar bike.

Berpirsiyar di dema meşandina xebatê de gava ‘têgeha trawmayê pirole bikin û têgeha trawmayê bi xwe trawmatîze bikin” wê xeletî bikin, wê li hember temas û destpêdanê bibe asteng.

Amadekariya berî xebatê û karbeşî ji bo berpirsiyaran girîng in, berpirsiyaran diparêzin û karê wan hêsan dikin.

Divê bi taybetî di hevdîtina ewil de, rêgezên ku hejmara wan ne zêde bin, berceste bin, zarok têbigihîjin û derbarê beralîkirina kêmasiyên bi temasa ewil hatî tespîtkirin de bin, ji hêla berpirsiyar ve bêne diyarkirin û divê ev rêgez bi zarokan re bêne nîqaşkirin, bê hewldan ku zarok van rêgezan bipeyitînin.

Hejmara berpirsiyaran li gorî firehiya qada xebatê, li gorî çawaniya komê û hejmara endamên komê diguhere.

Divê berpirsiyar xwedî wê hişmendiyê bin ku çawa haya wan ji hîsa jihalketinê û xerakirina çarçoveyê çêbû, bi şertê ku wekî dilxwaz her pêwendîdar be, karibin dev ji berpirsiyariyê berdin.

## AVAKIRINA QADA HEZÊ Û PÊBAWERIYÊ

### Kartêkerên Ku Ji Ber Kesan Derdikevin

- Têkiliyên di navbera endamên komê de û yên di navbera endamên komê û berpirsiyarên wan de divê li ser wî esasî be ku “li ser tiştên behs jê nayê kirin, bêne axaftin”. Ev yek ji bo pêkhatina hezê û qada ewle weke gava pêşî ne.
- Divê endamên komê karibin hestên xwe yên derbarê çalakiyên xwe de bêyî dudilî bînin ser ziman.
- Ji bo afirandina hezê û qada ewle hewcedarî heye ku di dema xweîfadekirinê de tu asteng tunebin û ji bo vê jî endamên komê ne xizmên hev ên nêzîk bin wê baş be.

### Kartêkerên Girêdayî Şertên Fizîkî

- Cihê ku xebat lê tê meşandin divê bêdeng be û li hember tacîzên derve parastî be.
- Hundirê polê divê têra xwe mezin be. Tê pêşniyarkirin ku serê mirovek 1.5 metreçargoşe cih hebe.
- Têhna cihê ku xebat lê tê meşandin divê bi qasî ku endamên komê karibin bi rehetî tevbigerin, germ be.
- Girîng e ku cihê xebatê li gorî temenê zarokan bê amadekirin, ji bo zarokên temen-biçûk xalîçe û mînder xwedî bandor in.
- Şewqa cihê xebatê divê têr bike.
- Divê li gorî temenê zarokan materyal bêne tercîhkiri.

## MANEDAYÎN û LÊHAYBÛN

Xebatên me yên berê li ser pêkanîna hezê û qada ewlehiyê bûn. Heke di qonaxa heyî de hatiye hîskirin ku zarok êdî dikarin hemû hestên xwe bînin ser ziman, wê çaxê berpirsiyar dikarin derbasî wê qonaxê bibin.

Xebatên me yên berê li ser pêkanîna hezê û qada ewlehiyê bûn. Heke di qonaxa heyî de hatiye hîskirin ku zarok êdî dikarin hemû hestên xwe bînin ser ziman, wê çaxê berpirsiyar dikarin derbasî wê qonaxê bibin.

Dibe ku zarok her ku diçe bêhtir hay ji trawmaya xwe çêdibe û dixwaze di vê qonaxê de vê yekê parve bike, sekna berpirsiyaran a li hember vê yekê girîng e; rola berpirsiyar divê ne ew be ku rê nîşanî zarokan bide, bibe parazvana/ê û xelaskera/ê wan. Divê berpirsiyar di vê qonaxê de tenê bide hîskirin ku ligel wê/wî zarokê/î ye.

Heke zarok bixwaze bipeyive divê berpirsiyar jê re bibe alîkar û heya dawiya gotinê tê lê guhdarî bike.

Heke zarokek biryar dabe ku li ser mijarekê bi berpirsiyar re tiştekî parve bike, divê berpirsiyar têbigihê ku ev gaveke gelek mezin e û li gorî vê cidiyetê tevbigere, tu car wê/wî zarokê/î di wê rewşê de nehêle, heya ew deriyê ku ji hêla wê/wî zarokê/î ve hatiye vekirin neyê girtin ji wê odeyê dernekeve, çawa ku berpirsiyar hîs kir ku li ser vê mijarê kêmasiyên wê/wî hene divê xwe bigihîne pispora/ê pêwendîdar û divê plansaziya gava ku li pey vê rewşê dê bê avêtin, bi wê/wî re bê amadekirin.

Di vê qonaxê de çalakiyên ku dê zarokan destek bikin divê bi baldarî bêne hilbijartin, em jibîr nekin ku em ê di vê qonaxê de bi awayekî nerm/ naîf li raboriyê vegerin, ji ber wê yekê çalakiyên ku em ê hilbijêrin jî divê wisa naîf û nerm bin, yanî divê em xwe ji çalakiyên ku bo zarokan peyama “de ka derdê xwe vebêje” bihundirîne, dûr bidin, divê em çalakiyên ku rêya axaftinê, xweîfadekirinê li ber zarokan vekin û şarezatiya wan xurttir bikin, li dar bixin.

Ewil divê berpirsiyar bike ku endamên komê bigihên qonaxa ku karibin bi rehetî hestên xwe parve bikin û piştre heya dawiya çalakiyê pirsên ku dê vê parvekirinê xurt bihêlin û heta xurttir bikin, bipirse û bersivan bi hevokên xwe bigihîne hev.

Pirs û hevok divê wisa bin ku rê li ber tevlibûna endamên komê veke û ragihandina di navbera wan de bêhtir bidome. Di vê qonaxê de hewldana berpirsiyar divê ne ji bo axaftina zarokan be, ev hewl dibe ku ji hêla zarokan ve bê ferqkirin û bibe sedema dûrketineke tûmî. Divê berpirsiyar şert û mercên guncaw û nemaze xwe amade bike, parvekirin, axaftin û gavavêtina bo vê bila tercîha zarokan be.

## JINÛVE AVAKIRIN

Divê bê bibîranîn ku zarok li gorî mezinan bêhtir xwe li xiyalan digirin. Hewcedariyeke girîng e bo zarokên trawmatîze ku li hember rewşên dijwar, weke rêyeke revê xwe li cih û kesên ewle yên di xiyalên xwe de çêkirine, bigirin. Em nikarin li hêviyê bin ku zarokek ku qurfa şer lê çêbûye, ji cih û warê xwe hatiye qewitandin, hemû baweriya wê/wî ya bi dinyayê, mirovan û dadê hejiyaye weke mezinan rabe parastina xwe pêşve bibe û xwe biparêze û baş bike. Xiyalên zarokan rasterast bi mekan re têkildar in û xiyal li ser mekanan ava ne, gava mekan tune bibin xiyal jî pê re têk diçin. Ji ber vê yekê divê zarok ji dêvla yên jidestçûyî ve vesazkirineke mekanî, derûnî û civakî pêk bîne û helbet ji bo vê vesazkirinê xiyalên zarokan, mekanê ku lê ne û derdora civakî bêne destekkirin û başkirin.

Tê payîn ku ji dêvla mekanê ku ji dest çûye mekanê nû yê lê weke mekanê mekanê xwe bibîne, têbigihê ku ji dêvla hevalên xwe yên berê û xiyalên xwe yên jidestçûyî ve, li mekanê nû û bi hevalên nû "ez dikarim bi ser bikevim û min fêm kir ku ez ne bi tenê me, ez dikarim bi van hevalan û li vir jinûve xiyalên xwe bi dest bixim".

Wekî mînak divê zarok karibe bibêje "min digot qey kes ji bilî Ehmed ji min fêm nake lê ez piştre têgihîştim ku Meheme yê ku aniha di koma me de ye jî herî kêm bi qasî Ehmed baş ji min fêm dike û ez û ew em dikarin bibin hevalên hev ên baş"

Divê her ku biçe baweriya wê/wî kesê/î xurttir bibe ku xwe bi xwe, bi biryarên rast, bi kesên baş re dikare jiyana xwe birêve bibe.

Tê payîn ku ew kes ji hestên xwe haydar be û bi wê haydariyê karibe derbarê dahatûya xwe de planan çêbike.

# ÇALAKÎ

## AVAKIRINA QADA HEZÊ Û PÊBAWERIYÊ

**Çalakiyên Hevnasînê**

## BETANÎ

**Temen:** navbera 5 û 18an

**Armanc:** Hevnasîn, hînbûna navan û bibîranîn

**Meriyet**

Endamên komê wê wekî ku li dora xelekekê bin, rûnin. Pêşengê komê wê navê xwe bi dengekî bilind bibêje û gogê biavêje hembêza yek ji endamên komê. Yê/ya ku gogê bigire dê navê xwe bibêje û gogê biavêje hembêza yeke din. Di dawiyê de hemû endamên komê navê xwe dibêjin.

Kom wê bibe du beş û du tîm bêne amadekirin. Du pêşengên herdu koman dê bi betanî, çarşef an malzemeyeke weke vana bigirin û bi vî awayî bibin du beş.

Ji her komê kesek wê nêzîkî betaniyê bibe. Wê pêşeng betaniyê daxînin jêr û kesên li ber betaniyê wê hewl bidin ku navê kesa/kesê hember bibêjin. Ya/yê ku navê ya/yê li hemberî xwe ewil bibêje bi ser dikeve û ya/yê ku bi ser bikeve ya/yê ku bi ser nekeve tevli koma xwe dike. Armanc ew e ku komek hemû endamên koma din tevli xwe bike. Lê heke kom qerebalix bin pêşengên koman dikarin piştî wextekê çalakiyê bi dawî bikin.

## Tesîrên civakî-hestiyarî

- qadeke pêbawer ava dibe.
- dibe derfet ku xwe îfade bikin.
- têkiliyên hevaltiyê bi pêş dixe.
- hestê kontrolkirinê bi bibîranînê bi pêş dixe.
- bixwebawerbûnê zêde dike.

## Kartêkera Rîskê

Tê hizirîn ku derbarê birêvebirina çalakiyê de tu rîsk tuneye.



# MANEDAYÎN û LÊHAYBÛN

## DI BEŞÊN CUDA DE HESTÊN XWE NÎŞAN BIDE

**Temen:** 11 salî û bi wê de

**Armanc:** Veguhastina razberiyê ber bi şênberiyê, têgihîştina hestan û nîşandana wan.

Beşa 1.: dilsar/tenê/xemgîn

Beşa 2.: dilteng/silbûyî/tirsiyayî

Beşa 3.: nerehet/hêrsbûyî

Beşa 4.: xweş/nerm/bextewar

Her ku zarok ji beşek yek bi yek derbasî beşeke din dibin li gorî beşa ku tê de ne tevdigerin. Di wê beşê de çi hîs bikin, bêyî axaftin bi tevgerên xwe nîşan didin (di wê navberê de mamoste dikarin bixin bîra zarokan ku ew beş kîjan beş e).

**NÎŞE:** Dema ku ev çalakî/xebat bo zarokên ji 6 salî mezintir bê meşandin bêhtir balê dikêşe û zarok bi awayekî çalaktir tevlê dibin. Yên ku xebatê bimeşînin dikarin bo diyarkirina beşan, kartonên ku her beşê nîşan didin û li ser wan rism hatine çêkirin, bi kar bînin. Zarok bi xwe jî dikarin berî çalakî/xebatê risman çêbikin, ev yek bo wan dibe wek amadekariya çalakiyê/xebatê. Zarok dikarin 4-5 kes bi hev re jî ji beşek derbasî beşeke din bibin. Heke wextê ji beşek derbasî beşeke din bibin nikaribin hestên xwe îfade bikin, teqez divê mamoste zor nedin wan.

**NÎQAŞ:** Yên ku xebatê dimeşînin dikarin ji zarokan bipirsin ku ka beşa tê de ne kîjan beş e, dîsa dikarin van pirsan ji zarokan jî bikin û bi wan re biaxivin:

- Hûn kengî xwe bi tenê hîs dikin?
- Dema ku çi diqewime hûn xwe bi tenê hîs dikin?
- Hûn dikarin behsa rewşek ku we xwe bi tenê hîs kiriye, bikin?
- Çi tişt dibin sedem ku hûn pê hêrs dibin?

....

## Tesîrên Wê yên Civakî û Hestiyarî

- Deranîna hestên heyî yên di kûrahiya giyan de
- Şênberkirina hestên razber
- Hevbibîrxistina hestan

## Faktorên Rîskê

- Divê perwerdekar pêş-haziriya xwe bike.
- Bo zarokan îhtîmala vegera li trawmayê

***Pêşniyar:*** *Di nav xwe de rîskan dihewîne, girîng e ku kesên ku di warê şêwirmendiya koman de jêhatî bin cih bigirin. Divê kesên profesyonel bimeşînin, ev yek xwedî girîngiyeke mezin e.*

**Nîşe!:** Hûn dikarin vê xebatê di bin serenavê "Jinûve Avakirin"ê de jî bi kar bînin.



# JINÛVE AVAKIRIN

## CÎHANA AŞTIYANE (Tillman û Hsu, 1999)

**Temen:** 12 salî û bi wê de

**Armanc:** Diyarkirina rê û rêbazên selihandina hestên neyînî yên heyî

**Lîstika Dramayê:** Berpirsiyar, talîmata li jêr, bo zarokên ku çavgirtî rûniştine yan jî xwe dirêj kirine, dixwîne. Ya/yê talîmatê dixwîne, hêdî bi hêdî, li gorî xal û bêhnokê disekine û talîmatê dixwîne.

‘’Îro hûn dikarin dinyayeke aştiyane xeyal bikin û wê bînin ber çavên xwe. Bedenên xwe rehet bihêlin û tevnegerin... Baxçeyekî xweş xeyal bikin. Bila tê de dar û kulîlk hebin... Baxçeyekî pirr xweş... Çêre nerm in... Hûn çîve çîva çûkan dibihîzin, çawa distrên. Lê binêrin ku çûk çawa hêdîka ber bi ezmên ve difirin... Hûn hîs dikin ku li vir çawa ewle û aram in. Hewzeke biçûk heye li nêzîk, tê de masiyekî biçûk î reng-zêrîn hêdî bi hêdî diçe û tê. Hûn dibînin ku dema hûn di ber hewzê re derbas dibin, du zarokên di temenê we de ber bi we ve tên... Destên xwe bo we li ba dixin û dibêjin “Merheba”... Bo lîstikê bangî we dikin... Hûn dibînin ku hûn bi wan re dilîzin... Hûn kîjan lîstikê dilîzin? Hûn demekê dilîzin û piştre bi zarokan re diaxivin... Hûn dibînin ku hin zarokên din jî li derdûdora we dilîzin. Her kes bextewer e. Li vê derê kes pev naçe... Hûn bi hevalên xwe re wexteke xweş dibuhurînin. Ku dema veqetînê tê hûn hemû ji hev re dibêjin “Bimîne di xweşiyê de”... Piştre hûn di xeyala xwe de dîsa li pola xwe vedigerin.

(Tillman û Hsu, 1999, r.9.)

## Qonaxên Nîqaşê

**Şênberkirina di hiş de:** Zarok, piştî xwendina berpirsiyar wan dîmenan careke din di hişê xwe de şênber dikin.

**Asta Têgehî:** Ji zarokan tê pirsîn ku ka ew cîhana aştiyane ya ku di hişê wan de şênber bûye cîhaneke çawa ye, li wir çi heye? Berpirsiyar dikare bipirse ku ka zarok çawa tevdigerin, kîjan lîstikan dilîzin û di dawiyê de çi diqewime?

**Asta Bîrbiriyê:** Di cîhaneke aştiyane de dema insan pêrgî hev tên û ji hev diqetin ji hev re çi dibêjin? Di cîhaneke ne-aştiyane de dema insan pêrgî hev

tên û ji hev diqetin ji hev re çi dibêjin? Berpirsiyar dikare ji zarokan bipirse ku dijberên aştî û aramiyê çi ne? Dikare bipirse ku ji bo cîhaneke aştiyane mirov dikare çi bike? Dîsa, dikare bipirse ku li derûdora xwe (di odeya komê de, di polê de, li dibistanê, li malê, li bajarê ku em lê ne û hwd.) em çawa dikarin aştî û aramiyê pêk bînin?

**Asta Tecrubekirinê:** Berpirsiyar dikare ji zarokan bipirse ku li cihekî aştiyane û aram mane yan na. Heke bibêjin "Erê", wê çaxê berpirsiyar wê bixwaze ku qala wê bikin.

**Asta Pêşvebirinê:** Wê zarok behsa dîmenê cîhaneke ne-aştiyane bikin, wê bihizirin û bibêjin ku ka wê çi taybetiyên wê hebin, wê li wê cîhanê bo insanan nêzîkatiyeke çawa hebe. Wê zarok hewl bidin ku gotin û tevgerên aştîxwaz û aramîxwaz tespît bikin û bibêjin.

## Çalakiya Destekker

Wê zarok, derbarê cîhaneke aştiyane de, dîmenên ku di hişê wan de şênber bûne, biresimînin û boyax bikin. Di vê navberê de, berpirsiyar dikare muzîkekê bi wan bide guhdarkirin ku ew muzîk wan rehet û aram bike. Wekî mînak, beşa Buhar (Spring) a berhema bi navê "Çar Kîşwer"(Four Seasons) a Vîvaldî ku klasîkeke dinyayê ye... Berpirsiyar û zarok dikarin derbarê aştiyê de stran û çîvanokan biafirînin û bi hev re bibêjin.

Berpirsiyar dikarin ligel zarokan kûklayên têkildarî aştiyê çêbikin. Dibe ku ew kûkla bo tilîkan an bo destan bin. Ev kûkla ji piçek kaxiz, ji perçeyekî cawê ku tilîk an dest têkevinê jî tên çêkirin. Mirov dikare li herî jora wê rûyekî xêz bike. Zarok dikarin li ser kaxizekê ku di şiklê giloverekê de ye, rûyekî xêz bikin. Dikarin vî kaxizî bi serê darekê ve bizeliqînin. Kûklayên xemilandî jî bi hirî (ji dêvla por ve) û bişkojan (ji dêvla çav ve) jî tên çêkirin.

Berpirsiyar dikarin ji wan re bibêjin ku ev kûkla dikarin weke mirovên ku di xeyalên xwe de, li cîhaneke aştiyane ew dîtine, tevbigerin. Wê berpirsiyar bo demekê bihêlin ku zarok bi kûklayan bilîzin. Lê di dema lîstikê de berpirsiyar dikare bipirse ku li cîhaneke aştiyane kûkla çawa nêzîkî hev dibin. Heke zarok bersiveke çê nedin, berpirsiyar dikare heya radeyekê bi pêşniyaran lîstika bi kûklayan ber bi cihekî ve bibe.

## Tesîrên Wê yên Civakî û Hestiyarî

- Hevrûbûna bi birîna xwe re
- Çareseriya pratîk
- Selihandina civakî û hestiyarî

**Pêşniyar:** Muzîk (Temrînên nefes û bedenê)



# TESÎRÊN ERÊNÎ YÊN XEBATÊN PIŞTEVANIYA DERÛNCIVAKÎ LI FÎDANLIKÊ

Ji bo ku em têbigihên ku ka tesîra xebatên piştevaniya derûncivakî li ser şêniyên Fîdanlikê çi ye him me bi xwe ev xebat raçav kirin him jî em kon bi kon geriyan û me ji malbatan jî pirsî. Di van serdanên konan de bi piranî malbatan got ku zarok bi awayekî kêfxweş û bextewer li mal vedigerin, bo demeke kurt be jî bêhna zarokan derdikeve û xemên xwe jibîr dikin.

Ji bo em bibînin ku xebata me ya ku ji Gulana 2015an heya Berfanbara 2016an li Fîdanlikê hat meşandin, çi tesîrên erênî li me û dilxwazan kir, me civîn û supervîzyonan li dar xistin. Di van civîn û supervîsyonan de hîsa ku herî zêde xwe da der "pevrebûna bo hestên hevpar" bû. Dema me xwest ku mebesta wan ji "hestên hevpar" çi ye; anîn ser ziman ku ew bi xwe jî di zaroktiya xwe de ji ber şer trawmatîze bûne û wek mezinan hîn jî trawmatîze dibin, ligel Êzdiyan hestên wan ên neteweyî (kurdbûn) bêhtir xwe didin der, cara ewil ligel Êzdiyan dixebitin û nêzîkî Êzdiyan dibin. Vana wek "hestên hevpar" rave kirin.

> *Weke pisporeke xizmeta civakî, weke dilxwazeke hay ji berpirsiyariya xwe heyî ez dikarim bibêjim ku tecrubeya li Fîdanlikê tecrubeyên min zêdetir kir. Erê, ez berê jî bo zarokan xebitîbûm lê bo zarokên ku ji ber şer trawmatîze bûne, cara ewil xebitîm. Ev xebata ku bo min cara ewil bû, ji hêla manewî ve ez tatmîn kirim, ji ber ku xebat wisa zor û trawmatîk bû ez pê dilxweş bûm, min hîs kir ku ez bi kêrî tiştekê têm. Zarok ligel me keniyan, em bûn hevparên xemên wan, em bi wan re jiyan û me bo wan hewl da, tu têgeh têrî nake bo ravekirina vê yekê, hîssiyateke wisa ye ku nayê tarîfkirin.'*

**–Pisporeke Xizmeta Civakî, dilxwaz**

Tişteke din ku dilxwazan pê xwe şanaz hîs dikirin ev bû; ji hêla şêniyên Fîdanlikê ve, bi taybetî ji hêla zarokan ve hatibûn qebûlkirin. Zarok ji ber xwe ve dihatin xebatan, heta hêj berî saeta xebatan dihatin. Bi vê yekê him dilxwazan xwe şanaz hîs dikirin, him jî bi vê yekê dihat peyitandin ku tişteke kêrdar dikin.

Xebata demdirêj a mûltîdîsîplîner bû derfet ku him xebat birêkûpêk bêne kirin û armancên bo demeke kurt hatibûn diyarkirin pêk werin, him jî encamên xebatê bêne raçavkirin û pê re bêne nîqaşkirin û nirxandin.

Li gorî fikrê hevpar ê dilxwazan xebata ku bi dilxwazî tê meşandin, yanê xebata ji derveyî karê xwe û bi xwesteka xwe hestên piştevaniyê berze dike û hilberîneriyê bi pêş dixe.

Dilxwazan di nav mijûliya karê xwe de herî kêm hefteyê rojekê veqetandin û hatin li Fîdanlikê xebat meşandin. Digel vê yekê ji Tebaxa 2015an pê ve, li bajarên weke Amed, Mêrdîn û bajar û navçeyên li derûdora vana bo wexteke zêde derketina der ji hêla rêvebirên dewletê ve hat qedexekirin. Tesîra vê yekê bi awayekî neyînî bo dilxwaz bi xwe jî çêbû ku ji cihekî çûyîna ber bi cihekî din qet ne ewle bû. Ligel evqas zor û zehmetiyan bo ku xebata li Fîdanlikê berdewam be dilxwazan her hewl dan. Dilxwazan gotin ku xebatên ku li xwezayê bo zarokan dihatin meşandin, diltengiya me jî beralî dikirin.



# DI BERDEWAMA XEBATAN DE ZEHMETIYÊN KU RÛ DAN Û RÊBAZÊN BERALÎKIRINA WAN

Di dema amadekirina projeyê de dihat fikirîn ku bo Navenda Xebatên Derûncivakî konên mezin bên vedan. Lê di dema destpêka xebatan de hat fêmkirin ku ev yek bo wê qadê ne guncaw e. Di kelegerma havînê de, di bin konan de, xebatên ligel zarokan û hevdîtinên şexsî gelek zehmet bûn. Ji hêla din ve, zarokan, bi taybetî jî êvaran, konan bi awayên din bi kar dianîn. Xebatkar her roja din mecbûr diman ku temîr bikin û paqij bikin. Him ji ber ku malbat nikarîbûn zarokan ji konan dûr bixin, him jî ji ber ku me her roj berî xebatên derûncivakî wext û kedeke zêde dida temîrkirin û paqijkirina konan me hewl da ku em xebatên xwe ji dêvla konan ve li cihekî din bimeşînin.

Me bi şaredariyan re çend hevdîtin pêk anî bo ku em konteynirên wan, bi wan re, bi dor bi kar bînin. Piştî ku qebûl kirin me xebatên xwe derbasî konteyniran kirin. Ji bo venêrîna konteyniran û kontrolkirina komên zarokan me ji ciwanên li Fîdanlikê alîkarî xwest û wan jî berpirsiyariya xwe bêyî kêmasî bi cih anîn. Vê yekê nîşanî me da ku gava mirov berpirsiyarî bide ciwanên li kampê him ew bi xwe pê şanaz dibin, him jî bo me xebatkaran dibe alîkariyeke hêja. Ji hêla din ve, piştî ku malbatan dîtin ku hin ji wan berpirsiyarî hildigirin ser xwe, êdî ji ber tevlibûna zarokan dudilî nebûn û zarokan jî bêhtir bawerî bi xebatkaran anî û bi dilrehetî hatin cihê xebatê.

Ji ber zehmetiyên jiyana li Fîdanlikê û ji ber şer û pevçûnên ku li herêmê dîsa rû dan (li cihên ku qedexeya derketina der hatibûn îlankirin dengê çekan olan dida û wan jî van dengan dibihîst; vê yekê jî tirsê bi xwe re dianî) Êzdiyan her xwestin ku ber bi Ewropayê (bi taybetî Elmanya) yan jî ber bi başûrê Kurdistanê (ji xeynî Şingalê) biçin. Hin jê çûn jî, lê gelek jê mecbûr man ku vegerin.

Hevdîtinên derûnî pêvajoyeke demdirêj e û ji herdu aliyan hewldan û xwebexşî divê. Ji ber ku rewşa nediyar li kampê jî berdewam e, girîngiya wext û cihê hevdîtinê derdixe holê. Ne wisa be, ev yek wê tesîreke neyînî li pêvajoya hevdîtinê bike. Ji ber ku Êzdiyên li kampê nezanîbûn ku dê roja din, hefteya bê, meha bê li ku bin, her pêkan bû ku hevdîtinên derûnî ji ber xwe ve bi dawî bibin (drop out). Ji ber ku vê yekê rasterast bi awayekî neyînî tesîr li hevdîtinên derûnî dike, piştî demekê hevdîtinên derûnî ji ber xwe ve kêm bûn.

Van çûn û hatinan çawa tesîreke neyînî li rewşa giyanî ya Êzdiyan dikir, bi heman awayî dibû sedem ku xebatên derûncivakî yên ligel zarokan jî birêkûpêk nemeşe. Di destpêkê de, xebatên piştevaniya derûncivakî ji hêla 3 dilxwazan(her yek xwedî pisporiyeke cuda) ve, bi komên girtî yên ku ji 20 kesan tên pê, dihatin meşandin. Piştre, ji ber ku çûn û hatin berdewam bûn kom veguheriyan komên vekirî.

> *Piştî ku mirov bi zarokan ve tê girêdan veqetîn tesîreke neyînî li ser mirov çêdike. Tu dibêjî qey tiştek ji te kêm bûye. Ev yek, di heman demê de tesîr li ser zarokan jî çêdike, ji ber ku hevalên wan ên komê diçin ew jî nebaş dibin'*
>
> **-Pisporeke dilxwaz**

Hin dilxwazan anîn ser ziman ku di xebatan de kêmasiyên xwe dîtine; ligel ku di pisporiya xwe de xurt bûn jî, derbarê trawmaya şer de bi têra xwe zanyar bûn û tecrubeyên wan tunebûn. Ji ber ku bernameya perwerdeyê ya projeyê bêhtir li ser teoriyê bû serê ewil li ser xebatkaran tesîra ku em li bendî bûn nekir. Ji ber wê em mecbûr man ku di navbera perwerdeyan de xebatên atolyeyê çêbikin û me piştî vana perwerdeyên derbarê pratîkê de meşandin. Ji ber ku di xebatên bi vî rengî de bername li ser aktîvîteyan bi rê ve diçe, girîng bû ku perwerde bêhtir bo hewcedariya xebatên pratîk bin.

## TRAWMAYA KU JI KESEK DIN HATÎ VEGIRTIN (SECONDARY TRAUMA)

Dema zanista derûniyê insanan tarîf dike weke jîndarên biyolojîk, xwedî derûnî û civakî pênase dike. Potansiyela her insanî heye ku heya dawiya emrê xwe biêşe, kêfxweş bibe, xemgîn bibe, bextewer bibe û hemû hestên din di xwe de bihîse. Piştî temasa di navbera kesên êşkêş û kesên profesyonel an ne profesyonel, dibe ku ew kesên profesyonel an ne profesyonel piştî temasê bi êşa xwe jî temas bikin û bi vê êşê ve bimînin, heke wisa bibe trawmayeke din derdikeve holê. Ji lew ev êş bo wan ne xerîb e, hemû bibîranînên wê/wî ne ku yan hatine serê wê/wî bi xwe yan jî ji bav û kalan jê re maye, belkî jî ji kûrahiya/biniya bîrê (remote memory) hatiye gihaye wê/wî. Ha ji bo vê yekê "trawmaya ku ji kesek din hatî vegirtin (secondary trauma)" tê gotin. Piştî mirov ligel kesên ku di bin tesîra şer de mane xebat bimeşîne, îhtîmaleke zêde ye ku mirov, bi trawmaya ku ji kesek din hatî vegirtin (secondary trauma) re rû bi rû bimîne.

Him ji ber ku raboriya dilxwazên ku li Fîdanlikê xebatên derûncivakî meşandin û raboriya Êzdiyan yek e, him jî ji ber ku jixwe trawmaya civakî ya berdewam (ongoing social trauma) tesîr li xebatkaran dike rîska trawmaya ku ji kesek din hatî vegirtin (secondary trauma) bo wan zêde dibe.

> *Stranên zarokan jî ez xistim halekî trawmatîk û bû sedem ku ez bêhtir bi zarokan re eleqedar bibim.'*
> *'Ji ber van şert û mercên wan, min weke mecbûriyetê didît ku divê ez li cem zarokan bim û ligel ku ez diwestim jî ez nikarim vî karî nîvco bihêlim (tenê bi awayekî fizîkî berdewam).'*
> *'Dema ku em ji bo bangî zarokan bikin em li nav konan geriyan min dît ku piraniya yên li kampê hatine hiştin jinên pîr in. Min hîs kir ku him ji ber pîrbûna xwe him jî ji ber ku zarokên wan çûne hest dikin ku hatine terikandin. Ev hîs bi min zor hat. Derbarê vê de, min xwest ku tiştekî ku li wan baş bê bikim. Ez hizirîm ku bo pîran mirov dikare maleke sohbetê ava bike. Min got qey wê bi vî awayî ji wî hestî pak bibim'*
> *'Û helbet trawmayên zarokan û mezinan gihaşt min jî û ev gelekî xedar e'*
>
> **–Pisporên dilxwaz ên ku di nav xebatên derûncivakî de cih girtine**

Ji bo kontrolkirina hestên dilxwazan û kêmkirina rîska sendroma jipertavketîbûnê civîn hatin lidarxistin. Şerê ku li herêmê ji nû ve rû da li ber civînan bû asteng ku birêkûpêk bêne lidarxistin. Ji lew re bi taybetî li cihên ku qedexeya derketina der lê hatibûn îlankirin, lê bi giştî li temamî bajêr jî xetere bû ku piştî wextekê mirov li der bimaya. Ji ber ku hema bibêje temamî dilxwazan li saziyên cur bi cur dixebitîn bo civînê dema herî guncaw jî piştî mesaiyê bû. Lê ji ber xetereyê ne pêkan bû. Dîsa jî, ligel van astengiyan, di dawiya hefteyê de, bi roj civîn hatin lidarxistin. Dema ev civîn hatin lidarxistin jî xebatên hin koman nîvco man.

Ji ber vê yekê, her çiqas ji ber şert û mercan bi awayekî birêkûpêk civîn nehatibin lidarxistin jî, em li ser wê baweriyê ne ku ji bo koordînekirina pêşveçûna xebatan û çareserkirina pirsgirêkan, hewcedarî bi civînên ku birêkûpêk bêne lidarxistin, heye.

Ji xeynî civînan, ji pispor û akademîsyenên ku xebat û lêkolînên civakî dikin daxwaza supervîzyonê hat kirin û wan jî bo wê piştgirî dan. Dilxwazan diyar kirin ku bi rêya perwerdeyan zanyariya xwe bi pêş xistine, lê bi taybetî supervîzyonan kêrhatî bûye ji bo xebatên wan ên li Fîdanlikê û xebatên wan ên li taxên ku qedexeya derketina der lê bi dawî bûne.

Divê neyê jibîrkirin ku di dema meşandina xebatên piştevaniya derûncivakî de digel perwerdeyan teqez supervîzyon bêne lidarxistin. Piştgiriyên bi vî rengî ne tenê ji bo dilxwazan, ji bo saziyên wan jî girîng in da ku bi vê yekê kapasîteya xebatên piştevaniya derûncivakî bê xurtkirin.

## BER BI BIDAWÎKIRINA XEBATÊN PIŞTEVANIYA DERÛNCIVAKÎ YÊN LI FÎDANLIKÊ

Him ji dilxwazan re, him jî ji saziyên din ên li Fîdanlikê re ji duh berê de hat gotin ku dê xebatên piştevaniya derûncivakî bêne bidawî kirin.

Bi organîzasyonekê, xatir ji zarokan û hemû şêniyên Fîdanlikê hat xwestin. Ji hêla din ve, dilxwazan ji zarokan re gotin ku dê xebatên komên xwe bi dawî bikin, heke zarok bixwazin dikarin tevli komeke din bibin, ew ê weke berê hefteyê carekê nebe jî bêne serdana wan.

Heke kom û kesên ku bo wan xebat tên meşandin di serdemeke jiyana xwe de bi rewşeke 'nediyar' re rû bi rû mabin, divê xebatkar di dema bidawîkirina xebatan de hay ji vê hebin da ku nebin sedem ku ew kes xwe bêhtir di nav nediyariyekê de bihîsin.

Heke hewce bike divê komên bi rîsk bêne diyarkirin. Heke li wê derê wekî din sazî hebin divê ev kom bo van saziyan bêne beralîkirin.

## HIN PÊŞNIYAR BO EW KESÊN KU DÊ XEBATÊN BI VÎ RENGÎ BIMEŞÎNIN

- Berî ku proje bê amadekirin, ji bo tespîtkirina hewcedariyên penaberên (asylum seeker) li kampê yan di nav civakê de, divê ekîbek bê sazkirin ku tê de kesên ku li ser tenduristiya giyanî yan zanistên civakî xebatan dikin, hebin. Ku vê ekîbê raçavî û nirxandinên xwe parve kirin, piştî wê divê li gorî hewcedariyan proje bê amadekirin.
- Divê di dema amadekirina projeyê de fikr û nêrînên kes û saziyên ku karibin piştgiriya xebatan, bên pirsîn, heke hewce bike bila ew jî bibin hevparên projeyê.
- Divê bangewaziyên bo projeyan ên saziyên ku dê karibin destek bidin projeyê, bêne şopandin û proje li gorî krîterên wan bê sererastkirin û bi vî awayî bê pêşkêşkirin.
- Heke tê xwestin ku dilxwaz di meşandina xebatan de cî bigirin, divê bo haydarkirina wan kes û saziyan torên medyaya civakî bêne bikaranîn.
- Îhtîmal e ku dilxwaz xwedî pisporiyên cuda bin. Ewil divê bo wan li ser trawmaya piştî şer û rêbazên beralîkirina wê perwerdeyeke liserhev bê amadekirin, piştî vê perwerdeyê dest bi xebatan bikin. Divê di nav mijarên perwerdeyê de nêzîkatiya etîk jî hebe, ev yek neyê îhmalkirin.
- Ji bo dabînkirina mesrefên weke çûnehatin û xwarinê divê budçeyek bê amadekirin.
- Divê perwerde û supervîzyonên ku dê di dema meşandina xebatan de hewce bikin, bêne diyarkirin û lidarxistin.
- Divê xebatkar yek bi yek li kon û malên ku penaber (asylum seeker) lê bigerin û derbarê bernameyê de agahî bidin wan, kes û pêşengên ku karibin piştgirî bidin xebatan tespît bikin.

- Divê nav, temen û adresên zarokan ên ku dê ligel wan xebat bêne meşandin, bêne berhevkirin û li gorî temen û hewcedariyên wan kom bêne sazkirin.
- Di dema meşandina xebatan de divê dilxwaz û koordînatorên projeyê zarokan baş raçav bikin û bişopînin. Divê zarokên ku hest û tevgerên wan biguherin bo derûnnas û derûnbijîşk (psîkîyatrîst) bêne beralîkirin.
- Bêyî ku prensîpa nependîtiyê bê jibîrkirin, agahiyên zarokên ku tevli xebatan dibin, agahiyên zarok û mezinên ku bi wan re hevdîtinên şexsî tên kirin, divê bêne raporkirin.


**Navenda Giştî ya Enqereyê ya WMMTê**
Mithatpaşa Cad. No: 49/11 6.Kat 06420 Kızılay, ANKARA
**Telefon** : +90 (312) 310 66 36
**Faks** : +90 (312) 310 64 63
**E-posta** : tihv@tihv.org.tr

**Nûnertiya Amedê ya WMMTê**
Lise Cad. Eyyüp Eser Apt. No:8/2 Yenişehir, DİYARBAKIR
**Tel/Faks** : +90 (412) 228 26 61
+90 (412) 228 24 76
**E-posta** : diyarbakir@tihv.org.tr

**Nûnertiya Stenbolê ya WMMTê**
Bozkurt Mah. Türkbeyi Sokak Ferah Apt. No:113/6 Kurtuluş-Şişli, İSTANBUL
**Telefon** : +90 (212) 249 30 92
+90 (212) 293 43 33
**E-posta** : istanbul@tihv.org.tr

**Nûnertiya Îzmîrê ya WMMTê**
1432 Sokak Eser Apartmanı No:5/10 Alsancak, İZMİR
**Tel/Faks** : +90 (232) 463 46 46
+90 (232) 463 91 47
**E-posta** : tihvizm@dsl.ttmail.com

**Navenda Referansê ya Cizîrê ya WMMTê**
Dicle Mah. Orhan Doğan Cad. Azizoğlu İş Merkezi No:33/5 Cizre, ŞIRNAK
**Telefon** : +90 (486) 616 86 07
**Faks** : +90 (486) 616 86 10
**E-posta** : cizre@tihv.org.tr